




# TÊ KO ŞER

HEJMAR 33

ILON 1986



TEKOŞER: KOVARA TEKOŞER, YEKİTİYA KARKER Ü XWENDEKAREN KURD LI BELÇİKA

NAVNIŞAN: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

N° BANKE: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezih YALÇIN

KOMİTA NIVİSKARIYƏ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçın

## N A V E R O K

BALEFIRËN TIRK LI KURDISTANA IRAQE .....	Pervîn .....	R. 3
PIRSEKE PARLAMANTEREKÎ BELÇIKÎ .....	.....	R. 4
REZIMANA KURDİ (VI): Dûbarebûna tîpan .....	Celadet BEDIR XAN û Roger LESCOT..	R. 5
KURTLERDE SANAT: Kasî, Lûrî .....	Nêrgiza TORÎ .....	R. 8
DİROKA KURDISTANE DI ANSİKLOPEDIYA ISLAME DE (VI): Malbatên Kurdi - Şerefname.	R.12	
ZIMANË KURDİ (II): Zaravên Kurdi .....	Fuad Hama XORSID .....	R.18
XEBATA ME .....	.....	R.23
TËKOŞER'DEN HABERLER .....	.....	R.23

## S O M M A I R E

LES AVIONS TURCS AU KURDISTAN D'IRAQ .....	Pervîn .....	P. 3
QUESTION D'UN PARLEMENTAIRE BELGE .....	.....	P. 4
GRAMMAIRE KURDE (VI): Fréquence des lettres ..	C. BEDIR XAN et R. LESCOT .....	P. 5
L'ART CHEZ LES KURDES (I): Les Kasî et les Lûrî .....	Nêrgiza TORÎ .....	P. 8
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (VI): Principautés Kurdes.	12	
LANGUE KURDE (II): Les dialectes .....	Fuad Hama XORSID .....	P.18
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES .....	.....	P.23

# BALEFİRÊN TÎRK LÎ KURDÎSTANA İRAQÊ

Pervîn

Weka ku em hemî dizanin, di nîvê meha tebaxê deleskerê faşist ê tirk, di çarçeva lihevhatina tirkî-iraqî de, ku di 14.10.84 de hati bû imza kirin, balefirêن xwe şandin Kurdistana Iraqê û bombêن xwe avêtin ser sîvîlên kurd. Di vê êrîşa hov de nêzîkî 150 kes hatin kuştin. Ango, ji hikumeta Tirkîyê re têr nake ku Kurdêن ku di nav sînorêن dewleta wê de dijîn her roj bide êşandin û kuştin, lê ew destê xwe, çiqas ji wê bê, dirêj dike derive jî!

Ev ne cara yekemîn e ku leşkerê tirk êrîşî Kurdistana Iraqê dike. Di Gulana 1983 de, nêzîkî 15.000 leşker di dirêjayiya 40 km de ket wê derê. Ev yek û bûyerin din ku hergav li çar perçeyêن Kurdistanê dibin nîşan didin ku her çar hikûmetên faşist biryar stendine ku bi her awayî têkoşîna gelê kurd vemirînin û ku dema ku pêwist be jî dijminayîen ku di navbera wan de hene bi awakî katî (muweqqet) deynin alîkî û hêzêن xwe yek bikin ji bo bigihêjin vê amancê.

Li gel hemî van hovîtiyan, li hundir û derveyî sînorêن xwe, hikûmeta Tirkîyê bê şerm Lihevhatina Mafêن Mirovî li O.N.U. (Rêexistina Netewêن Yekbûyî) imza kir û cihê xwe yê giring di sazendêن (muessese) rojavayî yên bilind de, weka NATO, Konseya Ewrupa û hwd....., stend. Û nuha jî dike têkeve Parlaman û Bazara Ewrupa!

Her pênc dewletên ewrupî: Fransa, Hollanda, Danîmarka, Swêd û Norvêj giliya xwe dijî Tirkîyê, ku di 1982 de li ber Komisyonâ Mafêن Mirovî ya Konseya Ewrupa danî

bû, di Kanûna 1985 de kişand! Ew dibêjin ku sedema vê kişandinê hebûna hin serbestî û dêmokrasî li Tirkîyê ye! Lê herkes dizane ku sedema rast ne ev e, lê aborî û rêzanî ye.

Li gora CEDRI (Komîta Ewrupî ji bo Parastina Penaber "multecî" û Derhatiyan), Tirkîye dixwaze 20 milyar dolar ji bo ava-kirina pîsesaziya (sinaet) xwe ya leşkerî razêne. Ji bo vê yekê, hevkariya şirket û dewletên ewrupî û amerîkî jê re gelek pêwist e.

Her ku pêwendiyêن Ewrupa û Amerîka yêن bazarî û rêzanî bi Tirkîyê re xurt dibin, ev dewlet bêtir çavêن xwe li ser hovîtiyan hikûmeta tirk digirin. Ü, mixabin, ev rêzana giştî kartêkirina (tesîr) wê li ser ramana tevane (fîkrê tevayıya xelk) ya rojavayî gelek mezin e. Berê her tiştî, gengaziyêن (wasite) weşanê yên giring, weka televizyon, radyo û rojname, gelek kêm agahdarî li ser rewşa Tirkîyê, û bi hêzanî Kurdistanê (her çar perçeyêن wê) didin. Loma, ne bitenê merivêن besit, lê dêmokrat û pêşveruyêن van dewletan jî bala xwe gelek nadîn vê navçeya stratêjîk a cihanê, û hêza xwe di xebata xwe de didin welatêن Latînî-Amerîkî û Afrika Başûr. Eger televizyonan her roj wêneyêن êşandin, kuştin û bombardmanên gelê kurd nîşan bidana, ewê pirsa me bala herkesî bikişanda û ewê dêmokratên rojavayî bêtir alîkariya me bikirana.

Ji bo vê yekê, divê ku em bê rawestan gengaziyêن weşanê û rêexistin û kesên dêmokrat bikişînin pirsa xwe ya giran û dev ji dubendiyêن ku di navbera me de hene berdin.

**Nîşank:** Li ser vê bûyerê, parlamanterê belçîkî yê Partiya Ecolo (Kesk), G. DUTRY, pirseke hêja ji Wezîrê Karêن Derve yê Belçîka, L. TINDEMANS, pirsî. Me ev pirs weka xwe di rûpela 4mîn a vê hejmarê de weşand.



QUESTION ECRITE DE Monsieur G. DUTRY, député, à Monsieur L. TINDEMANS,  
Ministre des Relations extérieures.

N. REF. : GD/AM/11/030986

OBJET : Massacres perpétrés par l'armée turque dans les régions kurdes  
de Turquie

Il me revient que le 15 août 1986, tôt matin, des avions de l'armée turque partis de la base militaire de Diyarbakir auraient bombardé la partie centrale du Kurdistan de Turquie, le long de la frontière turco-irakienne.

Complétant ce bombardement, une vaste opération de ratissage de la région aurait été menée, mobilisant plusieurs milliers de soldats, des chars et des véhicules blindés.

Des bourgs et des villages auraient été pris sous le feu, des personnes massacrées.

Monsieur le Ministre est-il au courant de cette opération menée par l'armée d'un pays membre de l'O.T.A.N. et du Conseil de l'Europe contre une fraction de sa population ?

Si cette information se révélait exacte dans toute son horreur, Monsieur le Ministre ne pense-t-il pas que la Belgique, soucieuse du respect des droits de l'homme et des droits des peuples, devrait s'élever vivement contre de tels agissements de la part d'un pays et d'un régime qui frappe aux portes de la C.E.E. ?

Georges DUTRY

# RÊZİMANA KURDİ

( Zaravê Kurmancî )

- VI -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (\*)

N E X S E

55. Her du nexseyên jêrîn di dema avakirina kovara kurdî HAWAR, di 1932 de hatin pêk anîn. Amanca wan hêsinkirina karê çapxanê bû, bi destnîşandana dûbarebûna (tekrarbûn) rêjeyî (nisbî) ya her tîp di zaravêñ kurdî yêñ cihê de û bi vî awayî bi ferzandayîna (ferzend: Firset) destnîşandana (tesbît) awayê pêkanîna sendûqên tîpan. Nexşa yeke-mîn bitenê ji bo kurmancî ye; ew li gora çend metnêñ (têkst) babetêñ cihê hat çêkirin. Sernivîsa (unwan) yekemîn giringiya rêjeyî ya dengêñ cida, cihê wan di gotin de li ku be, nîşan dide; ya duyemîn dûbarebûna bikaranîna wan di destpêka gotinan de nîşan dide.

Nexşa din rêjeya (nisbet) tîpan di her sê zaravêñ kurmancî, soranî û dumilî de dest nîşan dike. Ew bi alîkariya hevokan (cumle) hat pêk anîn. Ev hevok ji metnêñ ku berê hati bûn bi kar anîn hatin stendin û wergerandin bo soranî û dumilî (ji Palo û Sîwerekê).

Li gel ku giraniya van lîstan bitenê rêjeyî ye, me dît ku nivîsîna wan li vê derê ne bê kelk (feyde) ye. Piraniya rastiyêñ ku ji lêhûrnêrîna wan derdikevin lêkolîna wan berê hati bû çêkirin; ji bo vê yekê emê bitenê yêñ ku hîn ne hatine dîtin yan ên ku giring e meriv vegere wan bi lez (zû) bijimêrin.

NEXSE I. Dengdêrên dirêj û dengdêrên kurt bi rêjeyeke hema wekhev têñ dîtin. Ya kêmîrîn "u" ye.

Meriv kêmbûna gotinêñ ku bi "y" yan bi dengdêrekê dest pê dîkin dibîne. Du sêyekêñ 265 gotinêñ metnêñ me ku di vê rewşê de ne ji rayê (esl) biyanî ne; sêyeka dawîn ji gotinêñ welêt, ku di heyameke nuh de bi "h"yeke destpênek (a destpêka gotin) sivik bûne, pêk hatiye (li bend 52 binêre). Di dawiyê de, em bicarek tunebûna "u" di destpêka gotinan de dibînin.

NEXSE II. Ew dûbarebûna bikaranîna "j" di kurmancî de, li gora kêmbûna wê di dumilî û soranî de, ronî dike. Lê, sedema vê cihêtiyê ev e ku bi hêzanî daçeka "j" di yeke-mînê van du zaravan de bi "ra" û di yê duyemîn de bi "l" hatiye guhertin. Û bi vî awayî, "jî" bi dumilî "zî" tê gotin. Lê ev her du yekîte di zimanê axaftinê de gelek caran têñ bi kar anîn.

Em bala xwe bidin ku di soranî de dûbarebûna mezin a "m", "b" û bi hêzanî "w", weka ku me ew dît, cihê "v"ya kurmancî digire.

Bi ser de jî, di zaravê Başûr de bêtir "e" ji yê Bakur de heye. Bi rastî, daçekên kurmancî "li" û "bi" teşeyêñ (awa) wan di soranî de "le" û "b" ne; ji derveyî vaya, vejetandeka binavkirinê "-ke", di hin rewşan de, di dû navan de tê (nîşe: "Piyayeke hat" dêlva, bi kurmancî, "peyâ hat"). Bikaranîna vê teşeyê bû sedema dayîna navê henekê "Kurdeke" ji Kurdêñ Başûr re.

(\*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransî-kurdî: Pervîn.

## N e x s e I

### DÜBAREBÜNA TİPAN DÜBAREBÜNA GİŞTİ

a:	1500	î:	700	ş:	160
b:	650	j:	300	t:	400
c:	120	k:	650	u:	120
ç:	150	l:	450	û:	450
d:	840	m:	550	v:	500
e:	2200	n:	1300	w:	350
ê:	1000	o:	400	x-ş:	340
f:	150	p:	120	y:	200
g:	200	q:	140	z:	150
h-h:	350	r:	1100		
i:	1800	s:	340		

### DI DESTPEKA GOTINAN DE

a:	97	î:	12	ş:	188
b:	238	j:	22	t:	275
c:	135	k:	417	u:	0
ç:	179	l:	96	û:	4
d:	282	m:	259	v:	44
e:	120	n:	126	w:	28
ê:	11	o:	5	x-ş:	227
f:	111	p:	195	y:	4
g:	184	q:	215	z:	148
h-h:	258	r:	170		
i:	16	s:	292		

## N e x s e   II

### DÜBAREBUNA TİPAN DI ZARAVEN CIHE DE

	<i>BAKUR</i>	<i>BAŞOR</i>	<i>BAKURÊ ROJAVA</i> ( <i>Palo</i> )	<i>BAKURÊ ROJAVA</i> ( <i>Sîwerek</i> )
<i>a:</i>	239	232	292	292
<i>B:</i>	73	90	67	68
<i>c:</i>	10	20	27	28
<i>ç:</i>	29	24	27	26
<i>d:</i>	101	109	95	94
<i>e:</i>	378	564	386	389
<i>ê:</i>	170	85	151	167
<i>f:</i>	12	6	13	12
<i>ğ:</i>	44	51	40	38
<i>h:</i>	56	47	53	53
<i>i:</i>	337	291	308	296
<i>î:</i>	139	160	142	145
<i>J:</i>	62	10	0	5
<i>k:</i>	116	137	88	89
<i>l:</i>	64	130	66	63
<i>m:</i>	112	140	114	114
<i>n:</i>	260	231	238	253
<i>o:</i>	60	44	115	121
<i>p:</i>	27	28	30	29
<i>q:</i>	11	14	14	13
<i>r:</i>	191	209	212	222
<i>s:</i>	41	45	39	41
<i>ş:</i>	57	69	57	55
<i>t:</i>	133	131	86	90
<i>u:</i>	29	37	38	38
<i>û:</i>	62	54	40	44
<i>v:</i>	65	0	69	71
<i>w:</i>	83	161	95	98
<i>x:</i>	50	33	39	41
<i>y:</i>	51	68	45	44
<i>z:</i>	38	36	77	76

# KÜRTLERDE SANAT \*

-/-

Nêrgiza TORİ

Bu araştırmamla, elinize geçen belgelerden el verdığince ulusumun bir kesiminin bronz çağının sanat ürünlerini sergilemeye çalışacağım. Bu arada konuyu netleştirmek için sənati örnekleceğim kesimin yaşadığı bölgenin coğrafi konumunu ve kısaca tarihini vereceğim. Bu çalışmamla aynı zamanda ünlü Kürt ozanı Ehmede Xanê'nin Mem û Zin adlı ölümsüz destanında, 1700'lerde söylediği aşağıdaki sözlerini yenilediğime inanıyorum.

(Da xelk nebéjitin ko Ekrad  
Bé merifet in bē esl û binyad)

Türkçesi: (De kimse demesin ki kürtler sanatsız, hünərsiz ve kökensizdirler.)

Hemen söylemek gerekirse de Kürtler komşuları Sümerlere, Babil'lilere, Asur'lulara ve onların büyük uygarlıklarına sadece teşekkür-kür borçları vardır. Oysa Kürtler kendi kül türlerini yaratmış, korumuş ve geliştirmiştirlerdir.


Sanatını örnekleceğim kesim Kassi, Manni ve Urartularıdır. Her biri bir bölüm olacak yazımla önemli bir görevi yaptığıma inanıyorum.

NÈRGIZA TORİ

## KÜRTLERDE SANAT



denge komal



( harita : 1 )

\* Bu yazı "Kürt'lerde Sanat" (1986 - Stockholm) adlı kitaptan özetlenmiştir.

Sanatını sergileyeceğim Kassi'ler Ari ırkın dan bir ulustur. Kurt'lerin Zagros kolundan dırlar. Zagros dağlarının orta kesiminde, bu günü Luristan bölgesinde yaşıyorlardı. Bun lar, M.Ö. 1740 yıllarında, Zagros dağlarının daki ülkelerinde bir devlet kurdular.

Kassi'lerin güneybatı komşusu Babil devleti kılları Samsuditana(1561-1531) döneminde gücünü yitirdi. Bunun fırsat bilen Hitit Kralı Nattușili(1560) Babil ülkesine saldıra rak bu ülkeyi yağmaladı. Bunun üzerine Kassi'ler kralları Kastiliyas I. önderliğinde, yine kendileri gibi Ari ve Kurtlerin Zagros kolundan olan Guti ve Lulu'ların yardımıyla Babil ülkesini ele geçirdi. Bu ülkede M.Ö 1530 yılında Karduni adı altında bir devlet kurdular. Karduni devleti bu ülkede M.Ö. 1171 yılına kadar varlığını koruyabildi. Son Kralları Egamil'in Assur Kralı Aşşurdan I. (930-910) tarafından öldürülmesi üzerine Kassi'ler tekrar ilişkilerini hiç bir zaman kesmedikleri ülkeleri Zagros'un orta kesimindeki Luristan'a döndüler. Sanatlarını bu rada, kendi öz ülkelerinde yaratıp geliştir diler. Biz bu nedenle Kassi bronz sanatını Luristan bölgesinde, bir kısmının da Agré' (Irak Kürdistanında bir şehir) de görebili-

yoruz. Oysa bu şehir, eski adıyla Aqar Quf, Kassi Kralı Karugavzu tarafından yapılmıştır. Bitiminde de devletinin merkezini Babil şehrinden o şehire taşıdı.

Luristan, yukarıda da dejindiğimiz gibi Kassi'lerin ilk yerleşim bölgesidir. Bu nedenle Kassi bronrları yerine biz Luristan bronrları olarak tanıtabiliriz. Oysa bu bölgelenin ürünleri ağırlıktadır.

Biz Kassi sanatının diğer ulusların yazılı belgelerinden değil, ancak ele geçirilen sanat ürünlerinden tanıyabiliyoruz. Değişik bir deyişle Kassi bronrları arkeolojik kazılar ve daha çok bizzat Lur halkın bulup antikacılar satması sonucu ortaya çıkmışlardır. İlk kez 1928'de Lur kökenli, tarlasında çalışmakta olan bir adam tarafından bu bronz eserlerden birkaç tanesi bulunmuştur. O zaman bunların çok değerli antik eserler olduğu bu yoksul Lur'lu tarafından ve de bu bölge halkı tarafından kavranmamıştı. Antikacıların bölgeye üzüşmesi sonucu, zor durumda yaşayan bölgenin yoksul halkın dikkati kazılarla döndü. Bu tür kazilar sonucu çıkarılan eserler parçalanmaktan kurtulamışlardır.



Şunu disklerde güneş tanrisı Mitra'sın yuvarlak yüzü görülmüyor. Bunlar genellikle Luristan kazalarında bulunmuştur.

Biz Luristan'ı ilk yerleşim bölgesi dışında, bir de bronz süsleme sanatının yapıldığı yer olarak da tanıyoruz. Bu bölgede genellikle arkeolojik kazılardan çıkan eserlerin en eskisi M.Ö. 900-700 yıllarına aittir. Bu yıllar, yukarıda da dejindiğimiz gibi, Kassilerin Luristan'da oldukları yillardır. Bunnlar her türlü maddeler, özellikle silahlar, kılıçlar ve at takımlarıdır. Bu bronzlar büyük bir ustalıkla yapılmışlardır. Biz bütün bunlardan Zagros dağlarında yaşayan Kürt aşiretlerinin metal işlemesinde oldukça yetenekli olduklarıını görebiliyoruz. Kassilerlere ait bronz eserler ekteki haritada belirtilen yerlerden çıkarılmışlardır.

Luristan'daki bronz işlemeleri başka metal işlemeleriyle benzerlik göstermesine rağmen bütündeki gelişmelerinde bu bölgeye ait oldukları görülür. Tarihçilerin ve sanat tarihçilerinin karşılaştığı birinci zorluk yapılan eserlerin tarihlendirilmesidir. Oysa bunların Luristan'a özgü bir sanat olduğu herkesin birleştiği ortak bir noktadır.

Değişik kılıçlar, kamalar ve yıpranmış çalısmalar az bir sayıda komşu ülkelerde bu-

lunmuştur. Buralarda bulunan süsleme bronzları Luristan'a özgüdür. Yaptıkları süslenmiş balta başları, kanatlı hayvanların veya insan başlı hayvanların (bunlar hayal ürünü hayvanlardır.) heykelleri bulunmuştur. (örnek 1).

Yine, kahraman figürlerine rastlıyoruz. Bu kahraman, canavarlara hükmüyor. (Bu bir hatalı gücü zenginliğidir.) Kahramanlar ve hayvanlar bazı zamanlar birbirlerine karışmışlardır. Veya kahramanın göbeği yerine ikinçi başı vardır. (örnek:2)

Hayvanlar üzerine olan çalışmalar genellikle realistirler. Bilgi taşlarının kulpaları hoş bir şekilde modellendirilmiş aslan geyik veya boynuzları arkaya doğru kıvrılmış dağ keçisi kafası ile süslüdür. Bunlar bulunduklarında çok aşınmışlardır. (örnek 3)

Yukarıdaki açıklamalara örnek gösterilen resimler dışında, açıklamaları diplerinde yapılmış, az sayıda örnek eklenmiştir.

Tüm bunlarla Luristan bronzları ve Kassilerin sanatı hakkında az da olsa bilgilendiğimiz kanısındayım.



(örnek : 1)

Luristan'da bulunan insan kafalı kanatlı hayvanlar.



(örnek : 2)

Luristan'da bulunan bu heykelcik (M.Ö : 9-8) yıldızında canavarları elinde tutan bir heykelcigi gösteriyor.



( örnek : 3 )



Luristan'da bulunan bronz objektlerden görüntüler.  
(Yukarda) Bonuzları arkaya doğru bükülü olan bir dag  
keşisinin başı ve gövdesinin bir bölümü.

Ziwiyede bulunan scytiche sitilinde olan altın  
keçi ile karşılaştırılması.(altta)

# DÎROKA KURDÎSTANÊ DÎ


- VI -

B. Dema islamî het a 1920

Serefname

Berhemâ (eser) mîrê Bidlîsê Şeref El-Dîn, ku di 1005/1596 de qediya, ciheke istisnaî di nav civakzaniyê dîroka kurdî de digire. Dîroka Kurdan bixwe (cild I, ê weşana Veliaminof-Zernof) di çar besan de hatiye vegetandin. Beşa yekemîn li ser malbatê kurdî ku bi rastî ji karê (menfeet) taybetî (xusûsî) yêñ siltanetiyê kelk girt (istifade kir) dipeyive; a duyemîn di babeta malbatê ku nûnerên wan carna pere da çêkirin û xutbê bi navê xwe da gotin dinivise; a siyemîn xaniyêñ waliyêñ wirasî dijimêre; a çaremîn li ser dîroka hûr (bitefsîl) a mîrê Bidlîsê ye. Beşa yekemîn pênc malbatan nîşan dide: Merwaniyêñ Diyarbekir û Cezîrê; Hesenweyhiyêñ Dînawar û Şehrezorê; Fadliyêñ Lûrê Mezin (li LUR binêre) û Eyyûbî.

Ji bo ku cihetiya ku di navbera çînêñ



(sinif, tabaka) duyemîn û siyemîn ên mîran de ye hûr e, û ku rîzkirina van malbatan ji aliyê Şeref El-Dîn hişk e, çêtir e ku ev malbat li gora cihê cograffi yê zewiyêñ (erd) wan bîn rîz kirin û ku Cezîret Ibn Umar weka navend bê stendin. Di dû vê rîzkirinê de ewê ya êlîn Kurdêñ Farisistanê bê. Zewiyêñ çîna duyemîn (tevî Bidlîsê) ewê bi stérkekê (\*) bîn nîşan kirin.

Çiqas ji destê wî hatibe, Şeref El-Dîn êlan û maliyêñ serokêñ wan ji hevdu vediqetîne û divê ku hergav bingeha damezrana derebekî (fêodal) ya Kurdistanê li ber çavan be: Mîrin ji rayêñ (esl) cihê gelêñ kurd, ên kurdbûyî û fille, bi alîkariya êlîn şerkar ên kurd ku carna şarewanî (bicihbûyî) û carna koçer yan nîvkoçer in, hikm dikin.

## ENCYCLOPÉDIE DE L'ISLAM

DICTIONNAIRE GÉOGRAPHIQUE,  
ETHNOGRAPHIQUE ET BIOGRAPHIQUE DES  
PEUPLES MUSULMANS

PUBLIÉ  
AVEC LE CONCOURS DES PRINCIPAUX ORIENTALISTES  
PAR

M. TH. HOUTSMA, A. J. WENSINCK  
E. LÉVI-PROVENÇAL, T. W. ARNOLD et W. HEFFENING

TOME II  
E-K

LEYDE LIBRAIRIE ET IMPRIMERIE  
CI-DEVANT E. J. BRILL 1927 PARIS AUGUSTE PICARD éditeur  
82 RUE BONAPARTE

(\*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervin.

# ANSİKLOPÊDİYA İSLAMÊDE (\*)

## TOF A: DI NAVBERA CİZİRE Û DERSİMÊ DE

1. Mîrên Cezîre \* xwe ji rayê umewî didît, lê bapîrê xwe Xalid Ibn El-Welîd nişan dida. Di van darêن rayî (bi fransizî: Généalogie) yên tevlihev de, bîrhatiyêن girêdanêن malbatî yên kurdî yên Umewiyan bi hebîniya (rûmet, hurmeta mezin) navçeyî ya paşiyêن generalê binav û deng Xalid Ibn El-Welîd, ku gorêن (mezar) wan li Siirtê têن nişan dan, dihatin girêdan (Hartmann, Bohtan, 19, 124). Ji derveyî vaya, mîr di destpêkê de yezîdî bûn û bitenê paştir bûn sunniyêن rast. Piştî mirina Suleyman Ibn Xalid, sê zarokêن wî zewiyêن wî par kirin: Cezîre ji Mîr Abd El-Ezîz re bû, Gurgîl ji Mîr Hacî Beg û Finîk ji Mîr Ebdal re bûn. Paşê, van her sê şaxan zewiyêن xwe ji xwe re hiştin.

Şerefname navê zewiyêن malbatê dike Wilayetî Boxtî (I, 310) û ew bi hûrî, lê bê rêz (sistem), navêن 14 nahiyyêن ku vî zewiyê giring ava dikin dijimêre: Gurgîl; Arwax; Pîrûz, Badan û Tanzê (Kalhûk), ku ji aliyê êla karsî hatine vegirtin (ısgal kirin); Finîk; Tûr, Haytam û Şax, ku tê de Fille rûdinêن; Niş Atil; Aramşat ku tê de êla (Braspî) di nav êlên Boxt de ya sereke ye; Kewar yan Kamîz (?); Deyr-dih ku ya Tanzê ye.

Li gel lêkolîna hûr a M. Hartmann (Bohtan, di Mitteil. d. Vorderas. Gesell., 1896/2 û 1897/1, 1-163 de), destnîşandana hin ji van cihan ne gelek emîn e. Zewiyê Cezîret Ibn Umar di navbera kêleka rastê ya Bohtan û Diclê de bû. Kaniyêن Bohtan ne di vê mîriyê de bûn. Li Rojhilatê, hawsîyêن (cîran) Boxtiyan Sindiyan bûn (li AMADIYYA binêre) û li ser Xabûrê cih girti bû.

2. Bapîrêن waliyêن Xîzan, Isbayerd (Sparhet, Ispert, li ba Ewliya Çelebî: Isba'ird) û Muks (Mukus), her sê birayêن ku ji Belîcanê (Xnis), di dema Selçûkiyan de, hati bûn bûn (Şerefname, I, 217). Ela zewiyê sereke Namîran bû. Ev zewî di dirêjayiya rûbarêن (şax) kêleka rastê ya Bohtan de bû û heta li ser Merwanan dirêj dibû.

3. Şîrwan (li kêleka rastê ya Bohtan, li binê Xîzan û li Rojhilata Bakur a Siirtê). Bapîrêن waliyêن "Şîrawî" şagirtiya Eyyûbiyan dikir û ew di eynî dema ku tê de "Malikan" hatin Hisn Kayfa hatin Şîrwanê. Şîrawiyan heta rola wezîran li ba Malikanan dilîzt (berhem bixwe, I, 155). Paytexta Şîrwanê Kufra bû. Cihêن din ên girêdayî wê

Awîl, Şabistan (bi navekî din, Garni = Kirnik?) û Irûn bûn.

4. Bidlîs \*. Tê gotin ku êla Rûzagî (Rozağî) vî navî stendiye ji bo ku rojekê (rûzî) 24 malbatên fireh li gundê Tab ê nahiya Xoyt (îro qezayê Modkî, li Rojhilata Bidlîsê) civiyan û fêdérasyonekê pêk anî. Piştire, ev fêdérasyon di du şaxan de veqetiya: Bilbasî û Kawalîsî. Şeref El-Dîn (I, 361) 24 (25 bixwîne) malbatên Rûzagî, ku 5 ji wan rûniştevanê kevn in û yên din nuh in: Bilbasî (10 malbat) û Kawalîsî (10 malbat), dijimêre.

Rûzagîyan Bidlîs û Hazo (Sasun) ji qralê gurciz Tavît (David le Couropalate, 984-1001?) stendin. Paşê, ji Axlatê du birayêن ji rayê sasanî anîn. Yek ji wan bû mîrê Bidlîsê û yê din ê Sasun. 18 mîr ji şaxa Diya El-Dîn li Bidlîsê berê 1005/1596 hikm kir. Ev hikm bitenê di bin Selçûkiyan de (534-76/1139-80), di bin Ak Koyunluyan de (871-900/1467-95), di bin Şah Ismaîl de (913-20?) û di navbera 941 û 986/1534-78 de rawestiya. Di vê cara dawîn de Sultan Suleyman xwest ku zewiyê wirasî yê mîr Şems El-Dîn bi yê Malatyê biguherîne. Şems El-Dîn ji tirsa planênuh diviya Bidlîsê berde û çû ba Şah Tahmasp ku bi comerdî lê nêrî. Şems El-Dîn ku li sirgünê, di 940 de, çêbû bi qencî li sarayê lê hat nêrîn (heta ku Şah ew han da"teşvîk kir" ku wênekêşiyê "resm" hîn bibe). Wî çend navçeyê farisî, yek pey yekê, hikm kirin û serokê hemî Kurdêن farisî hat danîn. Piştî hatina Ismaîl II li ser hikm, Şeref El-Dîn gûmanan derbas kirin û ew ji Naxçuwanê hat dûr kirin. Ji wê derê, ew çû Wanê û Muradê İmîn hikmê Bidlîsê, û bi ser de jî di 991 de yê Müşê, da wî. Ji bo heyama (dem) 1065/1655, Ewliya Çelebî (IV, 81-128) wesfekî hûr ê Bidlîsê kir. Hebûnêن (milk) mîrê dawîn ê Bidlîsê, Şeref Beg, ji aliyê Tirkan di 1849 de hatin stendin (Lynch, Armenia, II, 149).

5. Ji waliyêن Sasun (Hazo) re IZZIN dihat gotin, ji sedema bapîrê wan Izz El-Dîn, birayê Diya El-Dînê Bidlîsî. Elêن Sasun berê Şîrawî, Babûsî, Sûsanî û Tamûkî bûn. Rûzakî (li BIDLIS binêre) paşê hatin wê derê. Derengtir, piştî ragihandina Arzanê, êlêن vê navçeyê: Xalidi, Deyr Muşanî, Azîzan, ku di destpêkê de girêdayî Hisn Kayfa bûn, xwe gihad êlêن Sasun.

6. Waliyên Suweydî xwe ji rayê bermekî digot. Bapîrêwan ji aliye êla Suweydî hati bûn xwedî kirin. Zewiyê wirasî yê Suweydiyan Genc bû (bi vî awayî, Veliaminoft-Zernof, I, 260: Kîx).

7. Dibe ku êla Pazûkî, ku Şeref El-Dîn dixe nav êlên Farisistanê (I, 28), ji êla Suweydî derketiye. Li gora Şerefnamê (I, 328) "oleke wê ya rast tu ne bû" û nîşanên çewtiyê (bi erebî: Rafd we ilhad) xuya dida. Ev êl di du şaxan de hati bû beş bûn: Xalid Begî û Şeker Begî, û girêdayî mîrên Bidlisê bû. Ji Xalidê "bêmîl" re weka zewî Xnîs, Malazgerd û nahiya Uhkan (?) a Mûşê hatin dayîn. Ew bi wan ewqas qurre bû ku xwest serxwebûna xwe îlan bike. Piştî şerrê Çaldiran (Çildêran), Suweydiyan Pazûkî ji gelek zewiyêwan bêpar hiştin (berhem bixwe, I, 257). Di dema Şah Tahmasp de, ji Kilic Beg, serokê Pazûkiyan, re Zagam (nêzîkî Tiflîsê) hat dayîn. Paşê, Pazûkî ber bi Alaşkert ku tê de ev êl mezin bû hatin birin.

8. Waliyên Mirdasî (di Selînnamê de: Mirdêsi) iddia dikir ku ew ji Ebbasiyan hati bûn. Bapîrêwan şêzekî ku ji Hekkarî hati bû Agîlê bû û Mirdasî bû bûn alfigirêñ wî. Ev êl bixwe xwe ji rayê erebî didît: Dibe ku Mirdasî ji Benû Kilab ên derdorêñ Helebê ku di nêzîkî 420 de, piştî hin şerran bi

Fatimiyan re welatê xwe berda bûn (li Lane Poole, The Muham. Dynasties, N° 45: Les Mirdasides d'Alep binêre). Giringtirîna van sê şaxan, ku jê re Buldukanî digotin, li Agîlê rûdinişt; pêwendiyêñ wê yêñ bas bi Ak Koyunluyan re hebûn. Di bin Şah Ismaîl de, Agîl ji aliye Farisan hat vegirttin. Ji du şaxen din ên Mirdasiyan, yek li Palû, Baixin (li binê Kîxî), û ya din berê li Bardac û paşê li Carmûkê (li Başûrê Erganî-Maden) hikm dikir.

9. Waliyên Çamîşgezek xwe ji rayê ebbasî digot, lê navêwan bixwe rayêwan ên tirkî (Selçûkî) nîşan didin. Navê êla wan Malkîşî (Malik Şahî?) bû. Nêzîkî 1000 agirêñ Malkîşîyan şagirtiya Farisan (li Farisistanê?) dikir. Hebûnên Malkîşîyan ewqas pirr bûn ku navê Kurdistan bû bû rêzaheva (gotina ku rêzayê "manâ" wê weka yê gotineke din e. Bi fransızî: Synonyme) Çemîşgezek (Şerefname, I, 163). Wan ew heta heyama Mogolan, Tîmûr û Kara Yûsuf ji xwe re hiştin, lê Ak Koyunluyan hertişt kir ku êlên ku ji Kara Koyunluyan re xwebextker (fedakar) bûn piçûk bikin û dijî Çamîşgezekan êla tirk Xarbandalu şand. Şêx Hesen Xarbandalu qewirandin û xwe xist bin destê Şah Ismaîl. Wiyê dawîn ew bi waliyekî faris guhert. Selîmê Imîn mîrê wirasî Pîr Huseyn vegerand.



Tîpekî Med. Nêzîkbûna wî ji tîpê Kurden Mukrî yêñ Malbata 4mîn a Abbasian (ku iro jî bi medê kevn dipeyivin) bê gûman e. (Egon Freiherr Von Eickstedt, Türken Kurden und Iraner seit dem Altertum, Stuttgart 1961).




Kurdeki Mukrî ji Kurdistana tenha ya Bakur. (Berhem bixwe, rûpel 89).

10. Hasan Keyf \* (li HISN KAYFA binêre). Mîrêن ("Malikan") ên navçeyî xwe ji rayêneyî didît. Zewiyê Hisn Kayfa ji bapîrê wan re ji aliyê waliyê (artûkî?) yê Mêrdînê hati bû dayîn. Mîrê yekemîn ku Şerefname nîşan da Malik Suleyman bû (736/1335). Ak Koyunluyan Hisn Kayfa stend, lê Malik Xelîl li Hamatê pena biri bû (iltica kiri bû) paşê zewiyê xwe ji nuh de stend. Ji derdorênen Hisn Kayfa, Şerefname Siirt, Bişêrî, Tûr ku carna ji derdorênen Cezîrê xuya dibe, berhem bixwe, 117, 127, 157) û Arzan di-jimêre.

11. Suleymani, waliyê ji rayê merwanî (umewî) di destpêkê de li Xûxê, li nahiya Xezalî (di navbera Kulp û Batman Su de, berê rûbarê wan), bi cih bûn û hêdî hêdî gelek kele û zewiyê ku heta Diclê dirêj dibû stendin. Wan konfêdêrasyoneke xurt a êlên ku piraniya wan koçer bûn hikm dikir û di havînê de ew diçûn heta Ala Tag (Niphatê). Giringtirîna wan a Banûkiyan bû, lê ya hêjatirîn a Basiyan, ku 1000 ji malîyên wê di bin serokê xwe Şâhsawar de çûn Beyazîdê, bû. Çend ji van êlan ola yezîdî digirt. Pêwendiyêن Suleymaniyan bi hawsîyêن wan ên Sasûn re ne baş bûn. Ew di du şaxan de beş bûn: A Kulp û Batmanê, û ya Mayyafarkînê.

12. Zrakî (bilîvkirina nuh ku ji aliyê



Eddê Şîr, di JA, 1910, 119-39 de, hatiye pejirandin "qebûl kirin"; li gora Şeref El-Dîn Zrakî hevgirtinek ji erebî, Azrakî, ye). Bapîrê malbatê, ku şêzekî ereb ji Sûriyê, ji rayê Elî bû, di heyama Artûk de gihajt Mêrdînê (516/1122; Ebûl Ferec, Muxtasar, 379). Vê malbatê xwe bi rêz ji malbatêne Artûkî û Ak Koyunluyan didît. Çar şaxêن Zrakiyan hebûn. Şaxêن sereke yên Tarcil (li Rojavaya Batman Su) û Atak bûn. Du şaxên din ên Zrakiyan Darzinî (dêra fille ya kevn, Deyr Zîr?) û Kurdikan (di navbera Diyarbekir û Mayyafarkîn de) ku ji zewaca mîrekî zrakî bi qereçiyekê re çêbû bû (duxtarî kabûlî), bûn.

13. Kilîs. Vê malbata waliyan bawer dikir ku ew ji malîyên Hekkarî û Amadyê bû. Bapîrê wan Mand (Mantaşa) şagirtiyê ji Eyûbiyêن ku jê re nahiya Kusayr (nêzîkî Antakyê) da bû kir. Wî di bin destelata (quđret) xwe de yezîdiyêن Kusayr û yên ku di navbera Hamat û Maraşê de rûdiniştin û Kurdên Com û Kilîs civandin. Di bin sultanê memlûk û Selîm I de, dubendî di navbera yezîdiyan (Şex Izz El-Dîn) û malbata Mand de derketin. Eva dawîn di karênen (iktidar) de ma, lê xuya ye ku mafêni wirasî yên vî zewiyê Sûriya Bakur ne xurt bûn.

## تاریخ الدول والامارات الكردية في العهد الاستعماري

« وهو تعریف المجلد الثاني من « خلاصة تاريخ الكرد و كردستان »

ألفه باللغة الكردية  
صالح محمد أمين نكي  
الوزير العراقي السابق سنة ١٩٣٧

عربه وراجعه الأستاذ  
محمد علی عوین  
المترجم بديوان جلالة ملك مصر للمعظم


سنة ١٣٦٤ - ١٩٤٥

الطبعة  
الافتتاحية

14. Hekkarî \* (li HAKKARI û ŞAMDINAN binê-re). Xuya ye ku Şeref El-Dîn cihê kevn ê vê êlê li derdora Amadyê, ku atabegên zengî ji wê derê ew ber bi Bakur vegerandi bû, nizanî bû. Mîrêne wê xwe ji pêşiyêne abbasî digot.

Mîrê yekemîn ku di Şerefnamê de hatiye nişan dan Izz El-Dîn Sér (dibe ku ev navê erebkirî ji Yezdan Sér hatiye), ku di 789/1387 de dijî Tîmûr di kela Wanê de xwe ragirt, bû. Di bin Ak Koyunluyan de, êla Dumbulî (ya Cezîrê) Hekkarî stend, lê Filleyêne Diz (Aşûrî) çûn Misrê ji bo ku lawê malbata kevn, Esed El-Dîn Zarrîn-Çang (çengê zêrin) vegerinin. Vê malbata ku cihê xwe rast kir navê Şambo stend (M. Garzoni, Grammatica della lingua kurda, Roma 1787, 4: Sciambo). Di dema Ismaîl I de, mîrêne Şambo di kela Bay de (li Şemdinanê) rûdinişt. Yek ji endamên malbatê li Wostanê (li Rojhilata Başûrê Wanê) hikm dikir, lê Rûzakiyan ji bo nahiya Kawaşê, li Rojhilata Wostanê, bi Hekkariyan re pev diçûn. Li Bakur, fermanrewaiya (hikm) Hekkariyan digihajt Albakê. Nûnerê dawîn ê malbata Nûrallah Beg ji aliyê Osmaniyan, piştî serhildana Bedir Xan Begê Botan, hat daxistin, û di 1845 de Halîme Xanim ji Tirkan re Baş Kale vegerand. Nêzîkî Hekkariyan navê êla Pinayış ku heta rojêne me dijî hatiye nivîsin (berhem bixwe, I, 97, 100).

15. Zewiyê Mahmûdî li Bakurê Hekkarî, li ser rûbarêne golêne Wan û Arçakê ye. Walî (merwanî) yan abbasî yên Botan ku di destpêkê de baweriyêne yezidî digirtin, Şerefname, I, 306) li wê derê di heyama Kara Koyunluyan de rûniştin û zû dubendiyêne wan bi Hekkarî û Dumbuliyen re çêbûn.



16. Dumbulî êlek ji Boxan (Botan) in (Şerefname, I, 118, 310: Dumbulî Boxt ku demeke dirêj yezidî ma). Paşê Dumbulî hatin Azarbayanê û li wê derê zewiyê Sukman Abad (Sögman-abad) li Rojavaya Bakurê Xoyê (îro: Zûrawa) ji wan re hat dayîn. Di bin Ak Koyunluyan de, Dumbuliyen Kela Bayê (li Şemdinanê) û besekê ji Hekkarî stendin (berhem bixwe, I, 193). Şah Tahmasp Xoyê ragihand (danî ser) "ocak"ê wan ê Sukman Abad. Di bin Sultan Suleyman de, ji Dumbuliyen re Kotur û Bargirî hatin dayîn; paşê Abâxa, Suleyman Saray (îro: Saray) û Çildêranê ragihandin. Zeyn El-Abidîn Şirwanî, di Bustan El-Siyaha xwe de (destpêka sed-sala XIXmîn), dibêje ku hemî Dumbulî şîf ne (li Şerefname, I, 312 binêre) û bi tirkî dipeyivin (!).

17. Bradost. Malbata waliyan ji Gûranan hati bûn û yan jî zarokên malbata Hesenweyhiyan bûn. Hebûnên (milk) wê li Rojavaya Urmîyê bûn. Şaxek ji wan li Somayê û yeka din li Tergewer û Kal'at Dawûd hikm dikir. Mayiyêne êla Bradostê nuha li Başûrê Şemdinanê li ser Rûbarî Bradost (rûbarê Zabê Mezin ku kaniya wî li Rojavaya Uşnu ye) ne.

18. Ustûnî. Em bawer in ku ev feslê ku di destnivîsan de tu neye girêdayî malbata yekemîn a Şemdinanîyêne ku navenda wan bi rastî Stûnî, di nahiya Harkî de, bû (li Şamdinan binêre)bûn.

19. Dîroka Zarza (li Zarzarî yê Şîhab El-Dîn Umarî binêre) ku di pêşgotina Şerefnamê de hatiye ilan kirin (li I, 10, 272, 280 binêre) di metn (tekst) de tu ne ye.

20. Tarza. Ev bend di destnivîsan de tu neye û em tutist li ser vê êlê nizanin.



## TOF D: LI BAŞÜRE HEKKARI

21. Amadya \*. Me dît ku bajarê Amadyê li cihê keleke kevn, di bin Imad El-Dîn Zengî de (521-41), ava bû bû. Malbata navçeyî ya Badînan ku Şerefname li ser wê dipeyive xuya ye ku li vî welatî, piştî hundabûna Zengiyân (di sedsalên VII-VIII mîn de), bi cih bû bû. Mîrên Amadyê bi germbûna xwe di xwendinên olî de navdar bûn. Şerefname navên wan ji heyama Tîmûrî dijimêre. Paşê (di bin Ismaîl I de), Badînaniyan qezayê Zaxo ku tê de Sindî û Suleymani rûniştî bûn û ku ji berê zewiyekî cihê bû (wilayetî Sindiyan) ragihand. Bi vî awayî, zewiyê Badînan perça mezin a welatê çiyayî li Bakurê Mûsilê (çiyayê Gara û hwd.) himêz dikir.
22. Tasinî (Dasinî). Feslê li ser vê êla yezîdî ya giring di destnivîsan de tu neye, lê di metn de tê nîşan dan ku mîrên Amadyê Dehokê ji sancakê tasinî stend (I, 109) û ku di 941/1534 de Selîm I sancakê Erbîlê û "bi giştî, hemî wilayeta Soranê dan Huseyn Beg Dasenî, yek ji mîrên yezîdî". Vê yekê şerrekî xwînî bi Soraniyan re derxist (I, 274-7). Vanên dawîn li dawiyê zewiyê xwe vegerand û Huseyn Beg li Istanbûlê hat kuştin. Li ser gundê Dasen li Hoffman, Auszüge, 202-7 binêre.
23. Sohran ("êñ sor"), paşiyêñ Kalûs, şivanekî ereb ji Begdadê, ku li gundê Hûdiyan, li nahiya Awan (ji zewiyê Soran), pena biri bû (iltica kiri bû). Lawê wî mîrê Balakan (li Rojhilata Rawandûzê) hati bû kirin û wî kela Awanê stend. Navenda Soranan, ku bi avakirinên wan xemîlî bû (Rich, Narrative, I, 157), Harîr bû (li ser rûbarê Zabê Mezin, li binê Rawandûzê). Soran di nêzîkî 1005 de hîn êleke xurt bû, lê şûn de, ew ji ber êrişen hawsêyan şikiyan, û Babanan (Rich, Narrative, I, 157) ji ketina wan kelk girt.
24. Baban. Bi rastî çend malbatê dûhev bi vî navî hatine nasîn. Zewiyê wan ê sereke li Bâşûrê Zabê Piçûk bû û navenda wî Şarî Bazêr bû, lê di 1199/1784 de, Babanan ji xwe re paytexkeke nuh li Suleymaniye ava kir.
25. Mukri, ku îro li navçeya Bâşûrê gola Urmiyê rûdinê (li SAWC-BULAK binêre), ji êla Baban veqetiya bûn.
26. Bana, mîrên Ixtiyar El-Dîn vî navî stendi bû ji bo ku ew bi daxwaziya xwe (bi erebî, ixtiyar: Bijartin) bûn misilman (li SAWC-BULAK binêre).
27. Ardalan (li ARDILAN, ŞAHRAZUR, SENNA, SISAR binêre).
28. Galbaxî (Şerefname, II, ragihan 36-45: Mêjuya "tarîx" ragihanê 1092 ye). Serokê wan Abbas Axa, ji êla tirk Ustacalu, li Marîwanê (li SENNA binêre) ji Bîge Beg Ardalan "kaniyeke av" stendi bû (900-42). Paşê, Abbas Axa li Bîlawarê, zewiyê kevn ê Kalhuran, rûnişt. Alîgîrên wî ji êlên cihê hati bûn stendin. Sah Tahmasp jê re hikûmeta Bîlawar û "dozde oymak" dilniya (te'kîd) kirin. Paşê, Derî (sarayê osmanî) ji Alî Xan Galbaxî re sancakê ku ji Kirind, Şayxan, Çakaran (?), Xorxora, Zend û hwd. pêk hati bû da. Di wê demê de jî Yar Allah "timar"ê Erekle (?), Rangrazan û Sahbaban (?) stendin.

29 Kalhûr (Kalhurr). Mîrên wan rayên xwe girêdidan Gûdraz, kurê Gîw, ê destana farsi. Navê êla Kalhûr Gûran e (I, 317), li gel ku hin destnivîs li ser "Kelhûr û Gûran" dipeyivin (Şerefname, II, ragihan 6). Sê şaxen Kalhûr hebûn: Yêñ Palangan (li SENNA binêre), Dartang û Mahîdaşt (li Kirmanşah binêre).

Hebûnên mîrên Darna û Dartang (îro Rîcab, li qezayê Zohabê), li gora Şeref El-Dîn (I, 319), ên Hulwana kevn bûn. Nêzîkî 1005, karêna (iktidar) Kubad Beg ji Dînawar û Bîlawarê gihajt heta Begdadê. Mahîdaşt û Bîlawar (li Bâşûrê serê Murwarî) "ocak"a (hebûnên wirasî) şaxa siyemîn a Kalhûran ava dikir. Şaxa Mahîdaşt bi hêzanî koçer bû, û dibe ku ev sedema kêmûna zanînên ku Şeref El-Dîn li ser wê dide ye. İro, Gûranan hebûna xwe ya kevn paraztiye, lê êla Kalhûr li navçeya Bâşûrê riya mezin Begdad-Kirmanşah rûdinê.

## TOF E: KURDÊN FARISI

Nexşa (plan) beşa Şerefnamê ya li ser Ekradi Iran ne pirr vekirî ye. Nivîskar ew di heyama ku tê de sînora tirkî-farisî ne hati bû danîn nivîsî.

Jimara êlên sereke yên Farisistanê sisê ye: Siyah Mansur, Çigani û Zangana. Tê gotin ku navên wan ên sê birayên ku ji Lûristan an ji "Gûran û Ardalan" derketi bûn bûn. Ji derveyî van êlan û yên ku Şerefname nîşan dide, "24 êlên" Karabaş hebûn (Li piştî Qefqasyê - nêzîkî 30.000

meriv di bin walîkî tenê de, û êla Gîl li Xurasanê, ji derveyî êlên piçûktir). Di dema Shah Tahmasp de, serokê Siyah Mansûran bû bû mîrê mîran ê hemî Kurdêñ Farisistanê (ew ji 24 êl bêtir bûn). Beşek ji Çiganiyan çû Xarcistanê. Ela Zangana (Zengene) li Iraq û Xurasanê xwe da xuya kirin.

# ZİMANÊ KURDİ

Belavbûna cografi ya zaravêni wî (\*)

- II -

Fuad Hama XORŞID

B E S A D U Y E M I N

Z A R A V E N Z I M A N E K U R D I

Weka ku hin rêwî (kesên ku digerin) û rojhilatzan di rayê (esl) zimanê kurdî û pêwendiya wî bi zimanê farisi de şas bûn, hinê din jî di destnişandana taybetî (xusûsiyet) û jimara zaravêni wî de û di pêwendiyê van zaravan bi hev re de şas bûn. Vê yekê gihand cihêbûna dîtinan di beşkirina zaravêni zimanê kurdî û cihêkirina wan de (20).

Ev dubendî di destnişandana xweyyiyya (şexsiyet) zaravêni kurdî de li ser du zaravêni kurdî yên sereke radiweste:

- Zaravê Kurmanciya Başûrî (ku di beşkiri-nen buhuri de bi zaravê Lûrî hatiye nasîn) (21).
- Zaravê Gûranî.

(20) Weka nîşe, ne sînorkirin: Basile Nikitine ve beşkirina çewt a zaravêni zimanê kurdî û belavkirina wan ya cograffi anî: "Zimanê kurdî di tofêni (kom) jêrîn de beş dibe:

1. Lûrî, 2. Kelhûrî (li wilayetên Kermanşah û Hawramanê), 3. Soranî (li Suleymaniye, Rawendûz, Şino, Sawc Bûlak), 4. Gûranî (li Akra, Amadya, Diyarbekir, Bidlis û Beyazîdî). Li Nikitine Basile, Kurdish Stories from my collection, B.S.O.S., cild IV, 1926-28, rûpel 121 binêre.

Meriv vê çewtiyê bixwe di yek ji lêhûrnêrînên nuh ên hêja de jî kare bibîne. Martin Martinus di têza xwe ya doktora de, dema ku li ser zaravêni zimanê kurdî peyivî, got ku ew di sê zaravêni sereke de, û bi ser de jî zaravê gûranî, beş dibe:

1. Zaravêni bakurî û bakurê rojavayî (kurmancî), 2. Zaravêni başûrî (soranî), 3. Zaravêni başûrê rojhilatî (sineyî, kermanşahî û lekkî).

Li Van Bruinessen M. M., Agha, Shaikh and state, 1968, rûpel 29-31 binêre.

(21) Nivîskar û rojhilatzan, dema ku li ser zimanê kurdî û zaravêni wî dipeyivîn, hergav vê vegetandina klassîk a zaravêni zimanê kurdî dikir: 1. Kurmanciya bakurî 2. Kurmanciya başûrî 3. Lûrî 4. Gûranî. Lê rastiyêni cograffi û zimanî hişt ku em beşûuna nuh a jêrîn çêkin:

- Kurmanciya bakurî: Zaravê ku li perçeyêni bakurî û bakurê rojavayî yên Kurdistanê belav bûye.
- Kurmanciya navîn: Zaravê ku li navçeyêni navîn û navendî yên Kurdistanê belav bûye.
- Kurmanciya başûrî: Zaravê ku li navçeyêni başûrî û başûrê rojhilatî yên Kurdistanê, ku bi navê Lûristan hatine nasîn, belav bûye.
- Zaravê gûranî.

(\*) Çapxana El-Wisam, Begdad, 1983. Wergerandin, erebî-kurdî: Pervîn.

Hin nivîskar van her du zaravan weka zaravên kurdî nabînin, lê ew bawer dikin ku ew ji zaravên zimanê farisî ne (22). Li vê derê, divê em li ber bidin (israr bikin) ku sedema vê dîtina çewt li ser van her du zaravên kurdî dîtina ne bêaliyî (ne objektif) ku ji bo amanceke rêzanî (siyasî) ya destnîşankirî hat amade kirin e, û ku fermanrewayên (hakim) Îranê ev dîtin girt, bi hêzanî di babeta girêdana zaravê kurmanciya başûrî (Lûrî) û Kurdên ku pê dipeyivin (23).

Rata (rat: Bi tirkî "durum") fermanrewayên Îranê li hemberî vî zaravê kurdî û Kurdên ku pê dipeyivin ji nêrîna wan a nijadparêz ku amanca wê têkdana (xerakirin) rastiya netewî û şareyariyî (medenî) ya taybetiyî ya gelê kurd û tecrubekirina tuwandin (helandin) û fariskirina wî tê. Û ji bo bicihanîna vê amanca xwe ya stratejîk, wan, ji Kurdên din ên Îranê bêtir, dest nîşan da yên ku bi zaravê Kurmaniya Başûrî (Lûrî) dipeyivin, û di vê yekê de wan ji çend sedemênu ku em li jêr bi kurtî dibêjin kelk girt (istifade kir):

1. Neguhdana beşa başûrî ya Kurdistana Îranê (navçeya Lûristanê) bi mebestî (bi quesdî) û paşdehiştina wê ji her alî ve, û bi hêzanî ji aliyê çandî, fêrkirinî, aborî û rêgaûbanî (rêgaûban: tevayıya riyan) (24).
2. Tenhabûna wê ya cografî, tunebûna rêgaûbanên nuh heta sala 1930 (25) û dûrbûna wê ji navendên tîşkirinên (tîşk: Xêza tavê) çandî û rêzanî yên kurdî yên din.



#### (22) Weka nîşe, binêre:

Minorsky, V. (The Quran), B.S.O.A.S., 1943, Cild XI, bes 1, rûpel 75.

Edmonds, C.J. (Luristan), Geog. Jour., 1922, Cild LIX, № 5, rûpel 340.

Soan, E.B. (Short anthology of Quran poetry), J.R.A.S., 1921, bes 1, rûpel 5.

#### (23) Weka nîşe, binêre:

Fuad KEMAL (Zarawekanî zimanî kurdî we zimanî edebî we nûsîniyan), Kovara Zanyarî, hejmar 4, 1971, rûpel 16-24. Û bi dîtina min, ev gotar ewê nîşaneke ne baş di dîroka nivîskarê wê û ya jîna Kovara Zanyarî ya temenikurt (ku imrê wê kurt e) de bimîne.

Û binêre: WAHBY Taufiq and C.J. Edmonds, (A Kurdish-English dictionary), Oxford, 1966, p.v.

(24) Di vê pirtûkê de, bi gotina (navçeya Lûristanê) em dixwazin bêjin Beşa Başûrî ya Kurdistana Îranê, ku ji riya Qesrî Şîrîn-Kermanşahê li Bakur heta Bender Dîlem û Hasarê li Başûr dirêj dibe û ku navçeyen Pêş Kûh, Piştî Kûh, Bala Girêwe, Bextiyarî, Kûh Gilo û Masanî himêz dike.

(25) Di sala 1936 de, hikûmeta Îranê biryar stend ku riya qîrkirî ya ereban a yekemîn di nav Lûristanê de çêke ji bo bicihanîna amancênu xwe yên leskerî dijî Kurdan. Gelê kurd li wê derê dijî van kirinan derket û tevlihevî di hemî bajarên vê navçeyê de çêbûn. Giringtirîna wan di wê salê de serhildana rûniştevanên bajarê Xurm Abad û derdorêne wî bû. Douglas yek ji nijadkujiyên bitirs ku Riza Pehlewî ji rûniştevanên vê navçeyê re di wê salê de kir wesf kir: Douglas, William O., (Strange Land and Friendly People). London, 1952, fesl 12, rûpel 104-109. Nivîskar vî feslî wergerand erebî û ew di rojnama Iraq, hejmar 1473, di 16.12.1980 de hat weşandin. Û bi kurdî ew di ragihana rojnama Iraq, hejmar 40, Cotmeh-Kanûn, 1980 de hat weşandin.

NARRATIVE

OF A

RESIDENCE IN KOORDISTAN,

AND ON THE

SITE OF ANCIENT NINEVEH;

WITH JOURNAL OF

A VOYAGE DOWN THE TIGRIS TO BAGDAD

AND AN ACCOUNT OF A VISIT TO

SHIRAUZ AND PERSEPOLIS.

BY THE LATE

CLAUDIUS JAMES RICH, ESQ<sup>M</sup>

THE EAST INDIA COMPANY'S RESIDENT AT BAGDAD.  
Author of "An Account of Ancient Babylon."

EDITED BY HIS WIDOW.

TWO VOLUMES.—VOL. I.

LONDON:

JAMES DUNCAN, PATERNOSTER ROW.  
MDCCLXXVI.

3. Tunebûna balxwedana navçeyî û netewî bi vî zaravî, sînorkirina fîrkirinê bi zimanê farisî û hilwesana weşanê bi vî zaravî. Loma, derî ji ketina çanda farişî û kartêkirinê (te'sîr) wê yên zimanî re vekirî man, û bi vî awayî çanda netewî ya kurdî û ev zaravê navçeyî paş de vege riyan.
4. Serekiya mezhebê şîî ku fermanrewayêngan Iranê weka regezekî (unsur) sereke jê kelk girt ku rûniştevanêngan vê perça Kurdistanê bikişînin ber xwe û ku ji bo nîrxdanêngan (sedemân giring) rêzanî û olî (dînî) hestêngan (his) wan nerm bikin,

ji bo têkdana girêdana wan a netewî û û kêmkirina hestêngan wan ên netewî yên kurdî.

5. Nehîştina gihajtina kartêkirinê tevgeren netewî yên kurdî nav vê perça Kurdistanê. Ev sedem çêkirina kortaleke mezin di navbera xwebextkeriya (fedakarî) netewî ya rast û xwebextkeriya ku fermanrewayêngan Iranê bi alîkariya sedema çaremîn ku me li jor got gihad bi awakî kûr amade kir.
6. Bi ser van hemî tiştan de jî, tucar xwenekişandina destelatêngan (iktidar) Iranê di hemî deman de (26) ji bikaranîna rêzanîn hişkbûn, kuştin, nijadkujî, awarekirin (aware: bê war, bê mal), dorgirtina aborî û derhilanînêlî (eşîrî) dijî rûniştevanêngan Kurdistanê ku her dema ku ferzend (firset), li gel kembûna wan jî, bikevin destêngan ew hestêngan xwe yên netewî yên kurdî nîşan didin. Amanca van destelatêngan jî ev e ku planêngan tuwandina gelê kurd û nehiştina wî bînîn cih.

Hemî van sedeman û sedemân din ku ji haydaran ne vesartî ne ji fermanrewayêngan Iranê re da bawer kirin ku tuwandina vê besa mezin ji zarokêngan gelê kurd, berê gel û netewîn din ên Iranê, hêsan e. Ü ji bo amadekirina vê yekê, wan pêñûsên (qelem) wê, ji bo têkdana rastiyêngan dîrokî, berdan. Lî rêzana tuwandina netewî û şareyariyî û ya têkdana zimanî nikare demeke dirêj li ber rastiyêngan bêaliyî rawest e.

Şerefname di sala 1596 de (27) berî hertiştî, angò berê ku hestê netewî yê kurdî yan ramana netewî ya kurdî baş xuya bibe, kurdbûna zaravê kurmanciya başûrî (lûrî) dilniya (te'kîd) kir. Rêzayê (mana) vê yekê jî ev e ku Şeref Xanê Bidlisî zaravêngan kurdî bi awakî hûr û ji kartêkirinêngan (te'sîr) hestî yên netewî yan ramana rêzanî dûr, dest nîşan dan. Basile Nikitine jî vê girêdanê dilniya kir (28).

- (26) Dîroka fermanrewayêngan Iranê bi rêzanîn nijadparêz ên weha tije ye. Şah Abbas (1571-1629) piştî zabûna Isa) rêzana derhilanîna giştî dijî êlén kurdî bi cih anî. Nadir Şah (1688-1747 p.z.) vê yekê jî kir. Şah Riza Pehlewî û Muhammed Riza Pehlewî rêzana kuştin û tirsandinê dijî gelê kurd ajot. Ü li ser derhilanîna Kurdan di dema Şah Abbas û Nadir Şah de binêre: Van Bruinessen, berhem (eser) bixwe, rûpel 215-220.
- (27) Bidlisî, Şeref Xan, (Şerefname), wergerandina Hezar, çapxana Numan, Begdad 1972, rûpel 29.
- Bidlîsî, Şeref Xan, (Şerefname), wergerandina Muhammed Elî Ewnî, Cild I, Qahire, 1958, rûpel 12, û wergerandina Melle Cemîl Bendî Rojbiyanî, Begdad, çapxana El-Nejah 1953, rûpel 20.
- (28) Nikitine, Basile, (Kurdish stories ....), berhem bixwe, rûpel 121.

Lê kurdiya zaravê gûranî ji aliyê Şeref-name, Edmonds û Tawfiq Wahbî (29) hat dillîya kirin. Ü kesen ku pê dipeyivîn jî vê yekê bi awakî vekirî dibêjin.

Cihêtiya zaravên zimanê kurdî nabe ku bibe behane ji bo birînkirina reseniya (esalet) zimanê kurdî û serxwebûna wî weka zimanekî ku ji zimanê hawsê (cîran) cihê ye. Nivîskar û zimanzan, dema ku li ser zimanê kurdî dipeyivin, hergav wî di çend zaravan de bes dikin, lê piraniya wan li ser destnîşandana jimara zaravên wî yên rast li hev nayê (30). Me hin sedemên vê yekê di babeta her du zaravên kurmanciya başûrî û gûranî de gotin.

Ji sedema pirbûna zaravan di zimanê kurdî de, hinan bawer kir ku ev ziman bite-nê zaravekî navçeyî ku li gora gelîyan (gelî: erdê di navbera du çiyan de) diguhere. Major Noel vê baweriyê bi vî awayî pêşan dide:

"Gelek caran tê gotin ku zimanê kurdî bitenê zaravekî ku li gora gelîyan diguhêre. Rast e ku ev ziman li Başûrê Rojhilata Kurdistanê (babanî) hinek ji kurmancî cihê ye, lê ne rast e ku bê gotin ku ev cihêtiyênu ku di navbera wan de ne bingehî ne. Bi min re zilam ji Botan, Diyarbekir û Hekkarî hebûn. Hemî baş têdigihajtin hevdû û zaravê ku li dawiya Rojavaya Kurdistanê belav bû bû. Bitenê pêwist bû ku ew li wê derê çend heftan bimînin ji bo ku bibin weka ku zimanê mala xwe dipeyivin. Ev cihêti hene, û tê gotin ku hebûna wan bi hêzani di guher-tina dengêñ tîpêñ nerm de ye. Weka nîse: Min gotina (dayik) bi van awayan bihîst: Day, da, dî. Ev cihêti, bi taybetî, carna biyaniyê ku hîn ne bûye bihîstina dengêñ weha şas dike. Ü ev biyanî cihêtiya zara-

van bêtir dibîne gava ku rastî karê gotinêñ guherker, weka daçek, têrkerêñ kifşaniyê û gotinêñ din ku gelek têni bi kar anîn dibe.

Nîse: Gotina (nuha) li Suleymaniye (êsta), li Hekkarî (n'ha), li Rojavaya Kurdistanê (angoh) û bi awayêñ din jî, weka aneka, nika, henusâ tê bi lêv kirin. Loma, her kesê ku yek ji zaravên ku li navçeyeke Kurdistanê belav bûye baş zanibe kare bi hêsanî û zû rahêje zaravên din, û ji bo vê yekê bitenê pêkanîna lîsteke hin gotinêñ cihê têr dike (31)".

Lê li gel hebûna hin cihêtiyan di navbera zaravên kurdî yên navçeyî de, taybetiyêñ bingehî yên zimanê kurdî di hemî van zaran de baş xuya dîbin (32).

Di babeta jimara zaravên zimanê kurdî yên sereke de, beşkirina ku ji rastiyê nêzîktirîn e û ku li rastiyêñ zimanî û cografî tê ev e:

1. Kurmanciya bakurî
2. Kurmanciya navîn
3. Kurmanciya başûrî
4. Gûranî

Her zaravekî sereke ji van zaravan tofeke (kom) zaravên wî yên navçeyî (şaxî) heye. Ew bi awakî giştî di taybetiyêñ zimanî û dengêñ xwe de nêzîkî hev in, ji derveyî (ji xeynî) hin cihêtiyêñ sivik di hin gotin yan takane (tevayıya gotinêñ zimanekî), yan tipan de, yan jî di kartêkbûna hin gotinêñ zaravekî navçeyî bi gotinêñ zaravê hawsê (cîran) de. Meriv kare zaravên navçeyî yên zaravên kurdî yên sereke di nexşa jêrîn de têbibîne (baş bibîne):

(29) Wahby, Taufiq and C.J. Edmonds, berhem bixwe, rûpel V.

(30) Weka nîse, li pirtûkên jêrîn, ji derveyî çavkaniyêñ ku me li jor gotin binêre:

1. Zekî, Muhammed Emîn, çavkaniya buhûrî, rûpel 297-327.
2. Fuad, Kemal, berhemâ buhûrî, rûpel 24..
3. El-Mâî, Enwer (Kurd li Behdînan), Mûsil, 1960, rûpel 60.
4. Xal, Muhammed (Ferhengî Xal), Suleymaniye, 1960, rûpel 22.
5. Resûl Izz El-Dîn Mustafa, (Zimanî Edebî ye kegitûy Kurdî), Begdad, 1971, rûpel 19-25, û yên din.

(31) Noel, E.M., (Diary of Major E. M. Noel on special duty in Kurdistan from June 14th to September 21st 1919, Basrah, 1919, rûpel 9.

Ev pirtûk, rojname û bîrhatiyêñ Major Noel li ser gera wî li Rojavaya Kurdistanê di sala 1919 de dicivîne. Ji sedema giringiya vê pirtûkê, nivîskar ew di rojnama El-Iraq, hejmar 387 de, di 2.6.1977 de, pêşan da.

(32) Nikitine, Basile, berhem bixwe, rûpel 121.

## ZIMANÊ KURDİ Û ZARAVÊN Wİ

### Zaravê sereke

### Zaravê wî yê navçeyî (şaxî)

Kurmanciya bakurî	Beyazîdî, hekkarî, botanî, şemdînanî, behdînanî, zaravê rojavayî
Kurmanciya navîn	Mukrî, soranî, erdelanî, suleymanî, kermîyanî
Kurmanciya başûrî	Lûriya rayî (eslî), bextiyarî, mamesanî, kûhgilûyî, lekkî, kelhûrî
Gûranî	Gûraniya rayî, hewramanî, bacilanî, zazakî

### SEDEMEN PIRBUNA ZARAVÊN KURDİ

Pirbûna zaravên kurdî girêdayî gelek sedeman e, lê her du sedemên jérîn roleke sereke di cihêtiya vî zimanî de, ji dema hebûna wî ya pêşîn, dilîzin:

#### 1. Sedema cograffî

Rewşen xwederî (tebîf) yêndî Kurdistanê, bi çiyayên wê yêndî kaş, siveriyêndî (riyên teng) wê yêndî dijwar û riyên wê yêndî kêm, û rewşen awhewayê (iklîm) wê yê hişk, bi hêzanî di zivistanê de, kartêkirineke wan a mezin li ser dûrbûna êlîn kurdî ji hevdu hebû, bi hêzanî di heyamên kevn û navîn de, ji bo ku di wê demê de gengaziyêndî (wasite) ramانî (raman: fikir), çandî û yêndî tevli-hevbûnen mirovî bi awakî balkêş tu ne bûn. Bi vî awayî, van dûrbûn û tevli-hevbûn gihand avabûna cihêtiya teşeyêndî (awa) zimanî ku ev êl di dirêjayiya dem de bi kar tînin. Ü bi awakî hûrtir, sedema tenhabûna cograffî kartêkirineke wê ya mezin di pirbûna zaravên vî zimanî de heye.

#### 2. Sedema rêzanî

Ji bo ku Kurdistan bi yekbûneke rêzanî ku hemî navçe û awhewayêndî wê himêz bike xweşî ne dît, vê yekê jê re mîrasekî bêjeyî (edebî), giştî û tevane ne da.

Li gel xuyabûna hin dewlet û mîriyêndî kurdî yêndî serbixwe yan nîvserbixwe, bi hêzanî di heyamên islamî de, vê yekê rê ne da pêşveçûna zimanê kurdî yê yekbûyî. Di vajayê (eks) wê de, wê dûrbûn û cihêtiya van zaravan bêtir kirin. Sedema vê yekê jî muhra awhewayî (iklîmî) ya van mîriyêndî ku di piraniya caran de zaravê navçeyî yê ku li awhewayê wan belav bû bû han dida (teşwîk dikir) bû.

Lê divê em bêjin ku sînorêndî zimanî yêndî hûr û vekirî ku zaravekî sereke ji yekî din

yan zaravêndî wan ên navçeyî ji hevdu veqe-tînin tu nene. Di vajayê vaya de, hemî ev zarav tev li hev dibin û dikevin nav hevdu, ji bo ku derbasbûn ji zaravekî bo zaravekî din bi awakî pileyî (derece derece) û girêdayî hevdu dibe. Derbasbûneke nişkavî û beza (ê ku zû diçe) ku meriv bi destpêkbûna sînora zimanî ya zaravekî din bide hest kirin tu neye.

Weka nîşe: Merivê ku di nav rûniştevanêndî navçeya ku di navbera Erbil-Şeqlawê-Rawendûz-Hac Umran-Xane-Neqade, Miyandewah-Mahabad de dirêj dibe bigere, nikare sînora zimanî ku her du zaravêndî soranî û mukrî, ku navendîndî wan bi rêz li bajarêndî Erbil û Mahabadê ne, vediqetîne hest bike.

Meriv vê rewşen bixwe jî dema derbasbûnê ji zaravêndî kurmanciya bakurî bo ya navîn kare têbibîne. Basile Nikitine têdît ku hin tayoetî meriv dajon ku bawer bike ku zaravê Şemdînanê ne zaravekî kurmanciya bakurî yê zelal e, lê ku ew (merheleke derbasbûnê bo zaravêndî kurmanciya navîn e, ji bo ku tê de her du tîpêndî "ji" û "le" tu nene) (33).

Ev diyarbûne (bûyera tebîf) bixwe ji bo merivê ku di navbera Suleymaniye-Pencuwîn-Meriwan-Sinne de digere çêdibe, ji bo ku ew li sînora zimanî ya ku her du zaravêndî Suleymaniye û Erdelanê, ku navendîndî wan bi rêz li bajarêndî Suleymaniye û Sinnê ne, vediqetîne hest nake.

Ev rewşen bixwe jî, ji bo kesê ku di navbera bajarêndî Kermanşah-İlam-Xurm Abad-Şarî Kurd de digere sînora zimanî ku zaravêndî kurmanciya başûrî yêndî navçeyî vediqetînin hest nake, çêdibe.

Dûmahî heye

# X E B A T A M E

## 7 HEZİRAN

Şeva Gelerî ya Çandî ya Kurdistanê ku, li Etampes - Fransa, ji aliyê Ciwan Mamo hat amade kirin. Em bi raxistina pirtûk û kasetên kurdfî besdar bûn.

## 18 HEZİRAN

Em besdar bûn civîna çapê ya M.R.A.X. (Rêxistina Dijî Nijadparêziyê) ku li Parlamana Ewrupa, li Bruxelles, tevî çend parlementerên ewrupî, li ser mafêni biyaniyan li Ewrupa pêk anî.

## 6 HEZİRAN

Şeva çandî ya zarokên ermenî, ku ji aliyê komela ASART hat pêk anîn.

## 12 İLON

Em besdar bûn civîna çapê ya Info-Türk ku li I.P.C. (International Press Centre), li Bruxelles, amade kir.

Ev civîn bi sê hincetan (munasebet) hat pêk anîn: 1- 6 saliya hatina cunta faşist a tirk. 2- Civîna C.E.E. (Rêxistina Bazarê Ewrupî) ya yekemîn û fermî (resmî) bi

Tirkiyê re ku ewê di 16 İlona de li Bruxelles, bi besdariya Wezîrê Karêne Derve yê Tirkiyê, Halefoglu, çêbibe. 3- Derketina pirtûka nuh û mezin a Info-Türk li ser Tirkiyê ( Black Book On The Militarist "Democracy" In Turkey).

Info-Türk agahdariyeke gelek hêja li ser rewşa Tirkîye û Kurdistana Tirkiyê da. Gelek rêxistin û rojnamevan û berpirsiyarek ji Parlamana Ewrupa besdar bûn.

## DI MEHÊ DE CAREKE

- Civîn bi zanîngeha Aşîtiyê û rêxistinê din re, li ser mafêni mirov û gelan.
- Civîn bi rêxistina M.R.A.X. û yên din re ji bo xwestina mafê helbijartinê şaredâriyî (beledî) di sala 1988 de.
- Civîn bi komelêni civakî ku li şareyariya St-Josse, li Bruxelles, dixebitin.

## DI HEFTÊ DE CAREKE

Radyoya azad: Her yeksem, ji katjimêr (seet) 13 heta 15.

# TÊKOŞER'DEN HABERLER

## 7 HAZİRAN :

Ciwan Mamo'nun Etampes'te (Fransa) düzenlediği Kürtürel Halk gecesine kitap ve kaset sergimiz ile katıldık.

## 18 HAZİRAN :

M.R.A.X'ın (Irkçılıkla mücadele Örgütü) Brüksel'de, Avrupa Parlamentosu'nda birkac Avrupa parlementerleri ile beraber Avrupada'ki göçmenlerin hakları üzerine düzenlediği basın toplantısına katıldık.

## 6 HAZİRAN :

ASART'ın düzenlediği Ermeni çocukların geçesine katıldık.

## 12 EYLÜL

Info-Türk'ün I.P.C. (International Press Centre), Brüksel'de yaptığı basın toplantısına katıldık.

Bu toplantının üç sebebi vardı: 1-Türk Faşist cuntasının 6. Yıldönümü. 2-AET'nin (Avrupa Ekonomik Topluluğu) Türkiye Dış İşleri Bakanı Halefoğlu'nun da katılacağı Türkiye üzerine resmi olan ilk toplantı. Bu toplantı

ti Brüksel'de, 16 Eylül'de olacak. 3-Info-Türk'ün Türkiye üzerine yayınladığı yeni büyük kitabı (Black Book On The Militarist "Democracy" In Turkey).

Info-Türk, Türkiye ve Türkiye Kürtistanının bugünkü durumu hakkında çok değerli bilgiler verdi. Toplantıya büyük çapta örgüt, gazeteci ve Avrupa Parlementosundan da bir temsilci katıldı.

## AYDA BİR :

- Barış Üniversitesi ve çeşitli kuruluşlarla beraber insan ve halkın hakları üzerinde yapılan toplantı.
- MRAK ve bazı kuruluşlar ile yabancıların 1988 belediye seçim hakları üzerinde toplantı.
- St-Josse - Brüksel - kültürel örgütleri ile toplantı.

## HAFTADA BİR:

Serbest Radyo: Her pazar günü saat 13'ten 15'e kadar süren radyo yayını.

# KURDISTAN PRESS

Rojnameya 15 Rojin • 15 Günlük Gazete



**DI ÎLONÊ DA DERDIKEVE • EYLÜL'DE ÇIKIYOR**

adress : **KURDISTAN PRESS**

**Örsvängen 6C , 172 42 Sundbyberg - Sweden**

**Tel : (46) 08 - 29 83 32 • 98 47 43 TELEX : 131 42 ANK**